


## Rêwîtî û xwendin

Gelek kes hene ku ne tenê riwîtî nekirin e, belkû li Ewropayê dijîn, lê zêde guh nedane welatê ku lê dijîn, heta serdana muzexaneyekê jî nekirin e.Gelek kes hene ku kêm caran derfeta riwîtiyê bo wan peyda bûye lê di warê zanîna çandên welat ....

dom»R:9





## Xelkê ceribandiye

Wan rojên vê dawiyê de û bi germbûna base egera êrîşa Îsraîl bo ser rêjîma Îranê û çêbûna şerê raste rast di navbera wan de, dîsan hinek bilendigoyên jengavî û xwediyê seha dîktatoriyê û alîgirên rêjîma navendgera li Îranê de, ku têniyê xwîna netewên bê mafe cografiyaya destçêkirî bi nave Îranê ne û dijî heçî maf û azadiyekê ne bo wan netewan, dest bi pirûpagendeyekî .....

dom» R:2

*Bidesîveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

*Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî*
*www.agirimedia.org Hejmar (480)21-10-2024Buha (1000) Tûmen*



## "Soza Sadiq" sadiqtir bû li dijî gel

Êrîşa mûşekî ya rejîma Îranê ya bi navê "Soza Sadiq 2" li dijî Îsrayîlê ku doma siyasetên şerxwaz ên rejîma Îranê li herêm û cîhanê de ye, Di hizra rejîmê de him weke hewlekê bo nişandana hêza leşkerî û selimandina teknolojiya xwe ya şerxwaziyê bi cîhan û nemaze Îsrayîl û dewletên herêmê jê dihat mêze kirin û him jî bi hêviya xurtkirina piştgiriya navxweyî ji rejîmê gav dihavêtin.

dom» R:3

# Daxuytaniya li derheq kombûna rêberiya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê

Li kombûna rêberatî ya Hizba dêmokrat a Kurdistana Îranê de nûtirîn guherînên li siyasî ên Kurdistanê, Îran û deverê hatine berhevdanê û tekezî li ser vê hate kirin ku komra îslamiya Îranê piştî zêdetir ji 4 dehikan çêkirina kirîzan û alozkirina Rojhilata Navîn, lawaztir ji her demekê ye û rastî mezintirîn qeyrana rewatiya siyasî hem li navxwe û hem li nava civatgeha cîhanê hatiye.

Kombûna rêberiya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îran, roja Dûşemî 16ê Rezberê, bi beşdariyta nêzî bi tevav a endamên rêberatî û bi armanca gengeşekirin û hilsengandina rewşa siyasî li Îran û deverê û hertwisa karlêkeriya wê rewşê li ser xebat û tekoşîna Gelên Îranê û tevgera siyasiya Kurdistanê bi rê ve ço.

Kombnûn bi ragitina xulekek bêdengî bo rêzgirtin ji yad û bi bîranîna şehîdên Hizba Dêmokrat û xebata mafxwazaneya gelê Kurd li Îranê dest pêkir. Piştre rêzdar Mistefa Hicrî, berpirsê Navenda Birêveberiya Giştî ya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê, şiroveya Navenda Birêveberiya Hizbê li derheq nûtirîn guherînan ên siyasî û dîtingeh û siyaseta Hizba Dêmokrat li hember bûyer û pêşhatên siyasî yên rojevê, şirove kirin. Li beşên din ên kombûnê de endamên rêberatiyê, dîtingeh û raya xwe li ser wan mijaran pêşkêş kirin û navenda Birêveberî ya Hizbê bo hejmarek erk û berpirsayetî, erkdar kir.

Rêberatiya Hizba Dêmokrat bi hilsengandina şerê nû yê li deverê ku li sala derbasbûyî de bi êrîşkirina Hemasê bo ser Îsraîl, dest pêkir û niha kevtiye duyemîn sala xwe de, li ser wê baverê bû ku komara îslamiya Îranê ku bizvîner û agirhilkerê wî şerî bû, hizir nedikir paşhatên bi ew qas giran bo ser xwe li pey xwe bîne. Komara îslamiya Îranê li yekem salê de bi rêya hêzên mnilîsên xwe û herwisa bi 2 car êrîşkirin bo ser Îsraîlê, beşdariya rasterast li vî şerî de kiriye. Şerik ku li wir de rewatî û pêgeha siyasî ya komara îslamî li civaka cîhanê de zêdetir ji caran bire jêr pirsyarê û niha pitir ji catran bo metirsiyeke mezin bo ser cîvaka navnetewî tê hisêb. Şerik ku ne şerê gelên Îranê nine, belku li dûr û nêzîk ve jî ti pêywendiyek bi Îranê ve nîne, ku çi komara îslamiya Îranê li wî şerî de ji aliyekê darayiya dehan saleya welat bo şerxwazî, tirorîzma navnetewî û çekdarkirina milîsên xwe bi heder daye, û ji aliyeke din ve jî xelkê Îranê bo îdeolojiya xwe bi barimte girtiye. Şerik ku rêjîm bi tevavî têde torandiye û şikest xwariye, lê li warê hişariya siyasî û hevxebatiya opozîsiyona rêjîmê dibe ku bi qazanca tevgera



nerizayetî û rizgarîxwaziya gelên Îranê be.

Rêberatiya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê li vê beşê de bi şirovekirin û hilsengandina xwe ku wa hizir dike hekî opozîsiyona komara îslamî li vê qonaxê de bi sehtir û amadetir ji caran reftar bike, hekî li ser binyata vêjmana hevpar bo derbasbûn ji komara îslamî û avakirina Îranê paşerojê, micidtir hewlê bo pêkanîna alternatîva li dijî rêjîmê bide û herwisa bikare şiyan û hêza xebatkariya hemû aliyan bi dijî rêjîmê kom bike, li vê rewşê de bikare destkevtên zor û bi nirx li berjewendiya xebata mafxwazaneya gelên Îranê bi dest xwe ve bîne.

Kombûna rêberatî ya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê li jêr ronahiya ceribandinên pêtir ên paşekêşiyên rêjîmê li wan deman de ku dikeve jêr givaşa derve, dikeve tengasiyê û şiyana domandina siyasetên xwe ên îdeoloijîk ji dest dide, wek vexwarina cama jehrê ji aliyê Xumêynî û erêkirin a sekinandina şer digel Îraqê an paşekêşiya Xamineyî ji lihevkirina Bercamê û paşekêşiya qehremanane, ew rewşa bi qazanca pêşveçona xedbata mafxwazaneya gelên Îranê li navxweyê welat şirove kir. Herwisa li vê derheqê de jî bo çêkirina baweîpêkirin û yekgirtin û hevxebatiya zêdetir li navbera netewan li Îranê û praktîka pitir a opozîsion û aliyên siyasî yên li dijî komara îslamî bi erkê hemûyan û hewcehiya herî giring a xebat û têkoşîna siyasî ya niha hate hejmartin. Kombûna rêberatî ya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê piştî gengeşekirin li ser çend mijarên pêywendîdar bi pêvajoya xebat û tekoşîna siyasî li Rojhilatê Kurdistanê û anînebrbas a hejmarek mijarên navxwe û nav teşkîlata Hizbê, dawî bi karê xwe anî.

**Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê**
**Navenda Birêveberî**
**17ê Rezbera 1403 a Rojî**



## Kurd divê bi dijminên xwe nexapin, ji bo dijminên xwe negrîn!

dom» R:5



## Di avakirina pergala nû ya Rojhilata Navîn de cihê Kurdan çiye an wê çi be?

dom» R:4

# Xelkê ceribandiye



N. Nûredîn Sofîzade



Wan rojên vê dawiyê de û bi germbûna base egera êrîşa Îsraîl bo ser rêjîma Îranê û çêbûna şerê raste rast di navbera wan de, dîsan hinek bilendigoyên jengavî û xwediyê seha dîktatoriyê û alîgirên rêjîma navendgera li Îranê de, ku têniyê xwîna netewên bê mafe cografiyaya destçêkirî bi nave Îranê ne û dijî heçî maf û azadiyekê ne bo wan netewan, dest bi pirûpagendeyekî berfire kirine ku belkî carekî din û li egera guhartinan de, malbata gendel û dîktatore paşayetî cihê rêjîma axundî bigre.

Carekî din hinek media kirine besîc ku berdewam navê Kurê Şahê dictator bêxne ser zimanan ku goya piştî nemana rêjîma Îslamî, kite altirnatîv Roza Pehlewî ye û bes.

Ji kesê weşartî nine ku serdemê rêjîma dîktatore Pehlewî yê bab û kur, serdemê herî reş û asmîlasiyona netewên xeyrî Fars bû ku yêk Ala, Yêk Ziman, Yêk Xak, û yêk çandê bi ser hemî netewan de sepand.

Hemî kes dizane ku serdemê rêjîma sernixûnbûyî a Paşayetî de heçî dengekî mafxwazî dihate fetisandin, û tu cure azadiyekî siyasî, çandî, netewî çinebûş

**Hekî îro rêjîma Axundî dest bi ser ser hemî serweta welat de girtiye û xercê dabînkirina çek û cebirxane ya girûpên tirorîstî li nawçê de dike û li pêxema şerxwazî û berfirehtirkirina îdolojiya kevnarperweraneye xwe dike, li serdemê rêjîma dîktatore Paşayetî de hemî serweta xelkê Îranê tenê li destê malbata Pehlewî de bû û hemî dihate talankirin û dihate dizîn û dikêşandine bo welatên dine.**

Ji bîra netewên bê maf neçoye ku Bab û Kurê bi du hevde yê paşayên Îranê, çawan xwîna şorişvan û rêberên Kurdan û Belûçan û Ereban û Azeriyan û Loran û Tirkimenan dirijand û ber çavê zarokên wan netewan rêberên wan li sêdarê didan.

Hemî ev xwînane bûn, hemî ev sitem û dujminayetiye bû, hemî ev bêmafkirnane bûn ku bûne girkan û peqiya û peşqelê wê agir berda tex û bextê rêjîma dîktatore Paşayetî li encamê de sala 1357ê ev dîktatorî sernixûn kirin.

**Ev tovê sîstema nasyonalîzma Farsî ku niha jî xwe serdest dizane, hemî berhema dîktatoriya rêjîma Paşayetiye ku ev heste wisa ji wan kiriye ku xwe xwediyê heyî û neyî ya Îranê bizanin û xwe derece 1 û netewên din derece 2 û blindest bizanin.**

Her ev mîratê şiyonîzmî bû ku piştre bo rêjîma Axundî re ma.

Netewên sitemlêkiriye xeyrî Fars yên li Îranê de, bi sedema wan herduk rêjîmên dîktatore bi du hev de, rastî gelek zilm û sitema siyasî, abûrî, çandî, bavirmendî , civakî hatine û li pêxema li ser xwe birina wê sitema sîstimatîk û rizgariyê û geheştina bi maf û azadiyan, nirxên gelek giran dane.

Lewraye ku ti yêk ji wan netewên xeyrî Fars bi çi nirxekê qebûl nakin ku careke din wegerin bo serdemê reşe Paşayetî.

Hekî qirar be li pêşerojê de û piştî sernixûniya rêjîma Axundî qewareyek bimîne bi nave Îranê, dive ew welat milkê hemî netewan wek hev be û her aliyek xwediyê hemî mafên siyasî, abûrî, civakî, netewî ye xwe bin û dive dur be ji sitem û asmilasyon û navendgerayî û xwe sepandina neteweyekê bi ser hemî xelkê welat de.

Hekî wisayeye bi ti avayekê rêjîma dîktatore paşayetî li nava xelkê Îranê û netewên wê de çinîne.

Ev kesê ku niha xevna geheştina bo ser textê Paşayetiyê li Îranê de dibîne, hemî kes dizane û ceribandiye û çi cudahiyekî wî digel rêjma Axundî çinîne û derbideriya 45 saleye wî li dunyaya derve û li nava navendên dêmokratîke cîhanê de û li serdemê ênformatîkê de, çi guherîn bi ser aqil û raya wî ya şiyonîzma netewa bala dest de neaniyê ku bêguman nabe çavnihêrê guherînê jî jê bête kirin.

Ev kurê Dîktatorekî xwîn mije û bi hesta faşîzmiya navendgera fiçik girtiye, lewra dibe baş bizane ku li pêşerojê de jî çi cihek di nava xelkê Îranê de çinabe.



# “Soza Sadiq” sadiqtir bû li dijî gel



N. Serbest Urmiye



Êrîşa mûşekî ya rejîma Îranê ya bi navê “Soza Sadiq 2” li dijî Îsrayîlê ku doma siyasetên şerxwaz ên rejîma Îranê li herêm û cîhanê de ye, Di hizra rejîmê de him weke hewlekê bo nişandana hêza leşkerî û seliman-dina teknolojiya xwe ya şerxwaziyê bi cîhan û nemaze Îsrayîl û dewletên herêmê jê dihat mêze kirin û him jî bi hêviya xurtkirina piştgiriya navxweyî ji rejîmê gav dihavêtin.

Lê di demekê de bû ku ji ber dorpêçên navneteweyî û qeyranên aborî yên demdirêj, rewşeke pir aloz di tev aliyên siyasî, aborî û civakî de pêsîra rejîma Îranê girtibûn. Pirsgirêkên weke qeyrana aborî, bilindbûna asta perçivîn(werimîn)a aborî û bêkariyê ku ji bilî pirsên siyasî û ewlehiyê, weke pirsên bê çareser yên hemû temenê rejîmê bûne, niha û nemaze piştî xurtbûna erîşên Îsrayîlê bo ser destek û taqimên şerxwaz ên girêdayî bi rejîmê ve li Lubnan, Felestîn û Yemen’ê, rewşeke aloztir ber bi rûyê rejîma Îranê kirine.

Ji hemûyan girîngtir kuştina li pey hev ya serok û reberên taqimên şerxwazên Hemas û Hizbellah’ê bandor li ser hitbara rejîmê daniye û tovê bêbaweriye li dor rejîmê di nava taqimên han de çandiye, ji ber vê çendê rejîm neçar e bihayeke maddî ya giran bide ku taqimên han li ser pê ragire û hêza mirovî ya nû, li dor wan kom bike. Di vir de ji ber cezayên tund ên aborî ku heta niha jî di encama siyasetên şerxwazane û bernameya navokî ya rejîmê de, li dijî rejîmê berdewam in, zexteke zêdetir xistine ser rewşa aborî ya welat.

Di heman demê de jî operasyona leşkerî ya vê dawiyê û aloziyên ku di encamê de derketine rojeva siyasî û aborî ya herêm û Îranê, dibe sedema xurtkirina dorpêçên navneteweyî û bê hêvîkirina hewlên dîplomatîk yên rejîmê di vê derheqê de û bandora vê ya nerênî jî li ser jiyana xelkê xuya ye.

Nizinmbûna bihayê pereyê Îranê li hember pereyên bîhanî di wan çend rojên borî de û ragihandina valabûna xizîneya dewletê ji aliyê Serok Komarê Îranê, Mesûd Pizişkiyan ve, hêviyên gel bo jiyaneke asûde di bin siya vê sîstemê de zêdetir bişavtin.

Ji bilî pisgirêka aborî û zedetir lewitandina rûmrta jiyana gel di bin siya rejîmê de, piştî êrîşa mûşekî ya rejîmê ji aliyên siyasî û civakî de jî rastî hin pirsgirêkan hatiye ku xêncî civaka navneteweyî, li hember civaka navxweyî de jî rejîm ji hin astengan asê bûye ku dîsan rasterast bandora nerênî li ser jiyana xelkê hene.



Hin ji astengan ku rejîmê bi kiriyarên xwe yên şerxwazîyê, bi taybetî piştî êrîşa mûşekî bo ser Îsraîl, di warên civakî û siyasî tê de asê bûye wiha tên hijmartin:

1. Nerazîbûna civakê di hember rewşa aborî de: qala rewş û wan pirsgirêkên aborî û bandora wan ya nerênî li ser rewşa jiyana xelkê ku di serî de hatiye kirin, xuya dike ku dabîn nekirin û bilinbûna bihayê hewcehiyên jiyanê di wan rojên borî de, yê bûye hegereke nerazîbûna civakî li dijî rejîmê û dibe ku berdewambûna rewşa han, dengê gel bîne ser şeqaman û meşên nerazîbînê jê derkevin.

2. Pirsa parastina jîngehê: bi slan e ku pirsa ji navçûna jîngehê pêsîra rejîma Îranê girtiye û xemsariya rejîmê di vê derheqê de bi eşkere tê dîtin. Kêmbûna avê bi taybetî ku li herêmên başûr û rojhilatê Îranê de astengeke mezin e li pêşiya xelkê û her weha jinavbirina samanên xwezayî yên welat ku destê taqimên girêdayî bi rejîmê ve tê de nehatiye veşartin, mijareke din e ku civaka navxweyî li hember rejîmê radigire û di rojên borî de careke din ketiye rojeva navxwyî ya Îranê de. Di meha borî de meşên nerazîbûnê bi taybetî di nav komên cuda yên weke cotkar, kedkar û xwendekaran de li dor rewşa nebaş a jîngehê hatin dîtin û li parêzgeha Îsfehanê jî li dijî hewlên rejîmê li dor zêdetir hildana kangehan ku bi baweriya xelkê yê bûye sedema pitir wêrankirina jîngehê û zêdebûna nexweşiyan, xwepêşandan hatin kirin.

3. Pirsgirêkên siyasî û navneteweyî: piştî ku bo careke din rejîma Îranê siyasetên xwe yên şerxwaziyê di êrîşa mûşekî bo cara duyem de li dijî Îsyayîlê destpêki, dîsan pirsa hêza leşkirî û aliyên şerxwaz yên siyasetên rejîmê di şopandina bernameya navokî de derketiye rojevê û rejîm ber bi rûyê lêpirsîn û lêkolînên navneteweyî kiriye û rejîma Îranê di warê navokî de gerreke din ya givaşa navneteweyî, bi taybetî di nava dewletên herêmê de xistiye ser rejîmê.

4. Bidarvekirin û mijarên mafên mirovan: Zêdebûna hejmara bidarvekirina welatiyan di mehên borî de û nîgeraniyên saziyên mafên mirovan di vê derheqê de, rejîm him ji aliyê civaka navneteweyî û him jî ji aliyê hindur ve li hember pêkolekê daniye ku rewşa rejîmê aloztir dike.

Di encam de ya ku tê dîtin, ji bilî êrîşa mûşekî, hemû bizavên rejîmê li dor bihêzkirina xwe di aliyê şerxwaziyê de ne û ne tişteke din ku zext û givaşa vê jî tenê xelkê welat keşandine û dikeşîne.

# Di avakirina pergala nû ya Rojhilata Navîn de cihê Kurdan çiye an wê çi be?



N. Hasan Harrani




Rojhilata navîn piştî sedsal şûn de ji nûve tê dîzaynkirin. Hêzên hakim yên sîstema cîhanî berî 20 salan biryara vê yekê dan. Ji wê demê virve amadekarî û midexeleyên vê pêvajoya guhertinê dest pê kir û didome.Ev proje li ser pîrbûn, kevinbûn kêmasîyên pergala sedsal berê hatibû avakirin saz bû.
Wek rexneya tenzîma berê hate rojevê û sedem, çavkanî û problemên heyî û tên jîyîn wek kêmasî, merezî û çewtîyên sîstema kevin hat dîtin îrdeya guherîn û nûkirina pergalê hasil bû.

Çavkanîya hemî problemên dijîn Îran, Tirkîye û hinek dewletên Ereban hatin tespîtkirin.
Lewre Îran her tim bi îxrackirina şoreşên Îslamî, Tirkîye jî bi astengbûna pêşîya mafê gelan û kêmnetewan û parastina statukoya heyî, gelek dewletên Ereban jî wekî astenga pêşîya çarenûsa pirsgirêka Îsraîl û Filistîn û gelek kêşeyên din hatin dîtin.

Lêgerîn û tespîtên di vî warî de ji 2000 î virve ji hêla Enstîtuya Rojhelat a Amerîkayê ve bi awayekî eşkere hatin ziman û di vî derbarî de gelek lêkolîn jî hatin weşandin.
Nîşaneyên guherînên îro tên xwestin di lêkolînên entutîyên lêkolînê yên Amerîkayî de mirov bi hêsanî û vekiri dikare bibîne.

Bi rastî jî li rojhelata navîn di nava pergala heyî ku sedsal berê dîsa ji hêla heman hêzên rojava ve hatibû tanzîmkirin gelek millet, kêmnetew û çand û bawerî bi vê pergalê heya niha têra xwe hatin eciqandin. Hîna jî zilm û zordarîya li ser vana bi awayekî herî tund û zalimane tê berdewamkirin. Mexdûrên vê sîstema hatibû sazkirin yên herî mezin bê nîqaş û bê guman îro heftê milyon Kurd in.
Amadekarîyên guhertina pergala rojhelata navîn ku hatibû kirin, bi midexeleya Amerîka ya Iraqê 2003 de kete merîyetê. Kevira yekem ya guhertina pergala herêmê li Iraqê hat kişandin. 2008-9 an de êdî me hewldanên amadekarîya guherinê ya berfireh jibo herêmê bêhtir berbiçav dît. Ev êdî raste rast bi me didan nîşan ku wê li rojhelata navîn wê gelek tiştbiguherin.

2011 an de fitîla agirê guherînê li bakurê Afrîkayê vêket. Ev pêvajo wekî Bihara Gelan dest pê kir.Di qadê de jibo dîzayna nû karê jendermetîyê spartibûn Tirkan. Tirkîyê jiber jeo stretejîya wê û jiber civaka wî ya ku bêtir nêzîkê sîstema rojava bû ew wekî modêl jibo herêmê tayîn kirin. Tirkîyê jî ev rol jibo xwe tiştekî gelek hêja dît û bi dilsozî qebûl kir.

Li gorî lihevkirina hêzên cîhanî û Tirkîyê, peywirgirtina vê guherînê de divîya Tirkîye bi vê projeyêre sadik bimana. Lê dema pêvajo destpêkir û şûn de Tirkîye wek firsendêr tevgerîya û xwest van derfetên hatine ber destê wî jibo emelên xwe yên împeryalî û ketin û bicîhbûna herêmê bikar bîne. Tirkîyê ji nava hêzên ku Amerîka jibo projeyê amadekiribû gellek grup û derdor bi xwe ve girêda û vana jibo pêkanîna xeyal û emelên xwe ya Osmanîya nû bikar anî. Tirkîyê bi van kiryaran dînamêt xist binê Projeya Mezin a Rojhelata Navîn. Tirkîye îxanet li vê projê û xwedîyên vê projê kir.

Sedema îxaneta vê projê a Tirkîyê ev bû: Sedem di vê projê de hebûna Kurdan bû. Belê sedema sereke ev bû. Lewre di projeya Mezin a Rojhelata Navîn de cihê Kurdan hebû û divîya di encama vê projeyê de herêmên Kurdan jî wekî Başûrê welêt bibûya xwedî statuyekî. Ev li hesabê Tirkan û Îranîyan nehat û ev sedem Tirkîyê û Îranî bi awayekî stratejîk dianîya ba hev.

Îro motora vê guherînê Îsraîle û sazkirina vê dengê bi Lewre tevdîlkirina vê projê ya Îsraîlê gunehê Kurdan kêm dike. Şik û guman û fikarên wan kêm dike. Yanî êdî Kurd dikarin bê bone û bê fikar di rêza duyem de daxilê vê projeyê bibin û doza mafê xweyê çarenûsê bidin meşandin. Kurd belkî jibo pêkanîna vê projeyê ji hêla zanyarî, teknîkî û aborî ve ne guncavin lê di qadê de jibo hêsankirina van guherînan dikarin gelek peywir bidin ser milê xwe.

Rojehelata navîn û Kurd di pêvajoyekî dîrokî de derbas dibin. Şensekî mezin îro hatîye ber derîyê Kurdan. Ti zemanekî de di nava hêzên statuperest û hêzên sîstema cîhanî de ewqas dubendî û nakokî çênebûne. Îro ne nabeyna Îran û hêzên rojavayî, ne nabeyna Tirkan û hêzên rojavayî baş e. Îro ev herdu hêz jî di hedefa guherîna rojhelata navîndene.

Ev jibo me Kurdan firsendekî mezine. Her wiha hêzên Ereban jî li hemberî Îsraîlîyan neçarin û îmkana ku Îsraîl derbas bikin bên li hemberî Kurdan bibin asteng nîne. Yanî di şert û zurûfên îroyînde ti ji kîjan hêlê de li mijar û firsendên rojhelata navîn binêrî, xwedê ji Kurdan re dibêje bimeşe ez bitere me.

Ev zagonekî xwezayîye. Di xwezayê de ev heye. Guherîn zagona xwezayê ye. Di xwezayê de zagona guhertinê dem e. Ti tiştekî li hemberî herikîna demê nikare bisekine. Ev jibo civakê jî wihaye. Kî li hemberî zagona xweguher bisekine difelişe. Îro li rojhelata navîn sîstema kevin difelşe û îmkana ku êdî li pîya bête sekinandin nîne.

Şuna mirov jibo berdewamîya wê bixebite, jibo felşandin û avakirina nû bixebite wê baştir bibe. Sîstemên kevin yên kevnar li pêşîya derketina enerjîya mirov û milletên bindest astenge. Di vê pergala heyî de îmkana ku enerjîya Kurdan ya jibo pêşveçûnê derkeve holê nîne. Lê ger Kurd di guherîna pergala rojhelata navîn de cihê xwe bigirin û bi sîstema hêzên cîhanî re di nava lihevkirinê de rê bigirin wê ew enerjîya wan ya xweguher ku bi sedê salane hatiye tepisandin derkeve holê û pêşîya nûbûnê li gelek tiştan veke. Her wiha wê şan û şirûdê Kurdan jibo pêşengîya gelên rojhelata navîn derkeve holê. Bila gumana ti miletekî cîhanê ji vê yekê nebe.

Jibo Kurdan ya pêwîst eve. Bila çav û guhê Kurdan li ser dijminên wan be. Lê bila guhê wan ji wead û gotinên dijminên wan yê xapînok re girtibe. Divê Kurd êdî ew zincîra xapînekîyê ji stûyê xwe biqetînin bavêjin. Divê bizanibin ku her banga dijminên wan jibo çareserîyê dafik û xefika bidestxistinêye. Bav û kalên me tim bi van bang û weadan hatine xapandin. Lê divê em neyên xapandin.

Divê Kurd vîya baş bizanibin: Dema dijminê we bang li we kir got werin em li hev werin,bizanibin ku him riya we rast e, him jî hun li cîyekî rast in. Cîyê Kurdan li kêleka hêzên guherkarin. Riya wan jî riya bidestxistina mafê netewî, yekbûna netewî û rizgarkirina axê ye. Kî îro li hemberî vê guherîna rojhelata navîn bisekine wê bifelişe.

Îro rewşa Hamasê, Hezbullahê û hêzên wekîl yên girêdayî Îranê çîye, çawane li ber çavan e. Van hêzên wekî van hêzan di sîstema rojhelata navîn de cîyê wan nîne. Ti luksîyetekî Kurdan nîne ku li hemberî vê pêla guherînê bisekinin. Cîyê Kurdan ne zemîne dijî vê zemîne guherkar e.

# Kurd divê bi dijminên xwe nexapin, ji bo dijminên xwe negrîn!



N. Cano Amedî



Gava mirov di gelîyekî re an jî tengavekî de derbas dibe, bi du rûyê gelîre rûbirû dibe, tu li kîjan alî bî dijberê xwe dibînî. Rastîya jiyanê jî li gorî wê dimeşe. Başî û xirabî; fedakarî û zexelî; wêrekî û tirsonekî; rastî û şaşî weke du rûyên madalyonê, wêneyên jiyanê radixe ber çavan...

Car caran fedakarî, rastî, duristî an bawerîya bê hesap dibe bela û mirov diêşîne. Dem tê di bin ewrên tarî de mirov bêmecal dibe, nikare rastîyan biqîre, pêlên xirabî û şaşîyan girsayî mirov dorpec dike. Her rastîyek dibe bar û di sitûyê mirov de dimîne. Tu nikarî yên hemberê xwe qane bikî, di demên wusa de şiîra (helbesta) Şêx Avdirehmanê Axtepeyî tê bîra mirov... Di şiîra xwe de dibêje: "Bila çil sal di zîndanan de bimînim/ Her roj sed mar û dûpişkan bibînim/ Li hevraza berê aşan bikişînim/ Li berwara pezkûvîyan biçêrînim/ Zivistan-an li ser avan bimînim/ Ne ku carek yekî ehmaq bibînim."

Di demên nêzîk de, sê bûyer, sê kuştin û sê navên ku sembola xirabî û xwînê bûn ketin rojeva me. Bertek û helwestên me, xemgînî û kêfxweşîya me, bi hemû reng û dengên cuda cardin derket holê ku civata me derizandinek kûr xwarîye. Taxên me, sekin û kelecanîya me rengê me radixe ber çavan.

Qasim Silêmanî, Îbrahîm Reîsî û Hasan Nasurallah... Sê aktorên esasî, sê sembolên teror û zulmê ...

Piştî kuştina wan kesan, di nav hemû beşên civatê de du helwestên dijber derket holê.. Xemgînî û kêfxweşî. Bi taybetî di nav civatê de, kêfxweşîyek mezin û berfireh desthilatdar bû, ev jî rewşa civatê û siyasetê radixe ber çavan.

Lê mixabin di nav kadroyên sîyasî de, ku kirasê wan cuda lê menzila wan yeke, weke cotikên dijber helwestên hevpar û xemgînîya xwe nîşan dan. Yek jê di bin kirasê "xelklerin kardeşliğî" de, yê din jî di bin kirasê "ummetê" de helwestên pasavanîya sînor û dewletên dagirkeran nîşan dan.

Her du alîyan jî rengê xwe, dengê xwe û cîhê xwe bi daxuyanîyên xwe, bi helwestên xwe eşkera kirin. Heta astekî mirov bı kar anîna ziman û helwestên dîplomasîyê têdigihîje an jî fam dike, lê hinek caran jî li hemberê bûyerên te girênade bêdeng an dûrmayîn jî şêweyekî dîplomasîyê ye. Divê herdem helwest û sekna me li ser bingeha hişmendîya netewî be!

Cîhê balê ye ku çep û îslamîyên tirkan di dijberîya Îsraîlê û Amerîkayê û di hevalbendîya hêzên terorî yên bi navê îslamê tevdigerin de, her di yek alîyî de ne, hevalbend in. Herweha cîhê balê ye ku, her ew alîyên çep û îslamî yên tirkan, li himberî mafên neteweyî, demokratik yên kurdan de jî bi bêdengî, yan jî bi lidijderketinê her dibin hevalbend. Cîhê xemgînîyê ye ku hinek çep û îslamîyên kurdan jî dikevin nav govenda van alîyên çep û îslamîyên tirkan, zerarê didin doza mafên kurdan.

Medyaya civakî êdî bûye hêzeke bingehîn, li ku çi diqewime, çi dibe, kî çawa tevdigere, kî hevalê kî ye, û li ser hesabê kê tevdigere radixe ber çavan... Hinek bûyer hene, bi helwest û sekna li hemberî wan bûyeran kûrahîya derizandina nav civatê û qerekterê alîyan derdixe holê.

Di demên nêzîk de, biryara Referandûma Serxwebûna Kurdistanê, êrîşên 16 cotmeha 2017an, kuştina Qasim Silêmanî, Îbrahîm Reîsî û Hasan Nasurallah, cardin da xuya kirin ku herkes, her tax li ser mirîyên xwe digirî... Îtîfaqên herêmî û gelemperî stratejîya alîyan derdixe holê. Parastina berjewendîyên netewî û berjewendîyên rêxistinî di demên ewha de derdikeve holê.. Kî bi kê re tevdigere, ji bo kî digirî, di xizmeta kê de ye, di rojên ewha de xuya dibe.

Piştî kuştina Hasan Nasurallah, di serîde "partîyên" çepê Tirkan, Hudapar, grûbên cîhadîst yên Tirk, derdorên Kemalist, hukumeta Tirk û partîya DEMê bi yek zimanî û yek helwestî nerazîbûna xwe anîn ziman. Bertek nîşandan, qîrîyan û bi hevre hêstirên xwe rijandin.

De em bêjin, heta radeyekê ev helwest li bejn û bala çep û îslamîyên tirkan tê. Le, emê ji wan alîyên kurdan yên bi navê umetê û bi navê çeptîyê ''ortak vatan''ê, ''Tirkîyecîtîyê'' diparêzin û piştgirîya yên wek Hasan Nasurallahê ku hevalbend û pêgirtîyê neyar û xêrnexwazê kurdane dikin re çi bêjin?

De werin li vê ecêbê, li vê sosretê, li vê rûreşîyê binhêrin. Gelo ev kîjan aqil û qewete ku wan alîyan bi hevre mobîlîze dike? Ev kîjan aqile ku "mirîyê xwe" li mal dihêlin, bi lez û bez li ber derîyê dijberên xwe, bi neyarê xwe re digrîn?

We çi zû ji bîr kir HALEPÇE, ENFAL, ROBOSKÎ, EFRÎN û felaketên din? We çi zû ji bîr kir, Dr Qasimlo, Dr. Sadiq Şerefkandî û hevalên wan? We çi zû ji bîr kir, ew dewleta terorîst ya Îranê, rojane bi dehan xort û keçên Kurd dadiliqîne, bi dehan feqîr û belangazên bi rêya kolberîyê jiyana xwe didomîne dikuje?

Ka ûjdan, ka ehlaq ka hûqûq û ka welatparêzîya we? Çawa ûjdana we dest dide, hûn li ser neyarên xwe digrîn? Ma hûn nizanin di hûqûqa dijmînatîyê de jî ev bêbextî ne rewşeke maqûle! Hûn xwe di heft rûbarên cuda de bişon jî, li gel dagirkeran hûn dîsa jî neyarin û bi we bawer nakin! Qet nebe car caran wesîyeta Qazî Mihemed bixwînin.



# Çend sedem bo şerê dawiyê!





N. Jêhat

Hinek caran rewş gelek bi zelalî dide xuya ku dê çi biqewime û pêvajoya bûyeran bi curekê pêk ve tête girêdanê ku her wekî hejmartina kitên tesbîhan, mirov dizane çend çone û bi dû de kîjan hejma dê bêt, û gorî hemî berhevdanan rista tesbîhên 100 hatine hejmartin û hemî kes dizane piştre kita 101 ê ye.

Bo berhevdana rewşa şer û alozîyên herêmî û şerxwaziya rêjîma Îranê, mirov dikare bibêje ku renge riste gehabe liba dawî û dê şerek çêbibe ku hekî rêjîma Îranê bi temamî neherifî ne jî, aliyê kêm dê ji şerxwazî û destêverdana li nava welatan, piştevaniya ji tirorîzma navnetewî û havêtina mûşekan bo welatan, bête sekinandin.

Bi gotinekî dinê cîhan geheştiye ser vê bawerê ku divê destê rêjîma Îranê bête kurtkirin û per û baskên wê ku hemen girûpên tirorîstiye li herêmê de bêne ji navbirin ku rêjîma şerxwaz ev 45 sale ji kîsê xelkê Îranê û serweta welat, wan teyar dike û sermayeguzarî li ser wan kiribû.

Bo îsbata vê rastiyê jî ku divê Îran bikeve ber gurzê siza û bikeve ber êrîşê, û bi taybet ku wan rojan zêdetir basê egera êrîşa Îsraîl bo ser Îranê heye, dikarim amajê bi wan çend sedeman bikim.

**1 -** Rêjîma Îranê bi 2 caran êrîşa mûşekî û dironî bo ser Îsraîl, hêcetek da dest Îsraîl û hemî cîhanê ku dibe Îsraîl jî ev mafe hebe bersiva Îranê bide.

**2 -** Ti carî bi qasî niha civatgeha cîhanî û welatên xwedî bandor piştevaniya Îsraîl nekirine û hem jî ti carî bi qasî niha xelk û aliyên siyasiye nava Îsraîl jî hinde yêkgirtî û hevhelwêst nebûne.

**3 -** Guherîna raya dewleta Amerîka li derheq rêjîma Îranê û girûpên girêdayî bi wê rêjîmê li nawçêde, ku pêştir Amerîka nedixwast bikevne ber êrîşa serbazî, lê niha parekî berçav ji êrîşan bo ser Hemas, Hizbullah, Husiyan û girûpên Şîeyên Îraqî, bi firoke û teknolojiya şer a Amerîka tête encamdanê, herçiqas ku Amerîka neyarê êrîş bo ser binkên Etomiye rêjîma Îranê ye, lê bi hemî avayekê amadeye ku digel Îsraîl êrîşê bike ser Îranê.

**4 -** Nîgeraniya hertimiye Îsraîl ji bernama Navokî a rêjîma Îranê ku hertim bi du hindê de bû ku tevgerek çêbe ku bikare civatgeha cîhanê ji wan nîgeraniyên xwe têbigehîne, îro rojê bi wan êrîşên mûşekiye bo ser Îsraîl, ev hêceta kevte dest Îsraîl ku bi hemî cîhanê bide xuyakirin ku hekî rêjîma Îranê bikare rojekê çeka Etomî hebe, çi guman li vê hindê de nine ku dê bi dijî Îsraîl bikar bîne, lewra niha derfete ku bikare vê nîgeraniya kevnare xwe werevîne û êrîşê bike ser binkên Etomî yên Îranê.

**5 –** Niha ku girûpên weke Hemas û Hizbullahê ku bi êrîşên Îsraîl li yêk sala derbasbûyî de piraniya hêza xwe û fermande û cebilxaneya xwe ji dest dane û êdî ti hêzek nemane weke berî bibne gef bo ser Îsraîl, derfetekî baş dide Îsraîl ku dema êrîşê bike ser Îranê, êdî nîgeranê Hemas û Hizbullahê li ber tenişta xwe nebe

**6 -** Îsraîl baş dizane ku li navxweyê Îranê de nêzî hemî xelkê Îranê ji dest vê rêjîma dîktatore Axundî vêzar bûne û li heçî serhildanekê de rêjîmê bi avayê herî hovane bi çekên şer ev tepeser kirine, hekî êrîşa Îsraîl bo ser Îranê demdirêj jî nebe û armanc ji nav birana wê rêjîmê nebe, egera hindê heye ku êrîşa bo ser rêjîmê wê derfetê bide xelkê û netewên bê maf ku li nav xwe de rabin û serî hildin û sanahîtir bikarin wê rêjîmê senixûn bikin.

**7 -** Îsraîl dixwaze bi êrîşa bo ser Îranê bi curekê welaên dinêye deverê jî têbigehîne ku nabe ti carî bikevne xeyala derbe lêda li Îsraîl û qedera rêjîma Îranê û girûpên terorîstî yên girêdayî bi vê, dikare bibe qedera wan welatan jî, bi kurtî Îsraîl dixwaze hêz û şiyana xwe bo mayendebûna xwe di nava wan hemî dujmin û neyaran de bide xuyakirin.

Belê bi wan sedemê ku hatne baskirin, Îsraîl ne tenê biryar daye, belkî xwe amade jî kiriye ku êrîşekî giran bike ser rêjîma komara Îslamî ku bo heta heta gefa wê li ser xwe wêde bide, Îca ev êrîş kengê û çend rojên dinê ye girîng nîne.




## Nerîna



**“Nêçîrvan Barzanî”:**

**“Serkeftiyê yekem ê vê hilbijartinê gelê Kurdistanê ye”**



**“Ehmed Turk”:**

**“Ger gelê Kurd niha nikaribe yekitiya xwe pêk bîne paşeroja wî dikeve metirsiyê”**



**“John Kirby” :**

**“ Astenga herî mezin a li pêşiya pêkanîna agirbesta li Xezeyê Sinwar bû.”**



**“Benjamin Netanyahu”:**

**“Hewldana Hizbullahê ya kuştina min û hevjîna min xeletiyek mezin bû”**

# Piştî dagirkariya Artaxê, hîn berpirsên dewleta Nagorno li Bakû girtî ne!



**N. Eskender Ceiferî**




Azerbaycanê bi piştevaniya Tirkiyê dest daniye ser beşeke zêde ji axa Ermenistanê. Bi taybet komara Artaxê bi tevahî hatiye dagirkirin.

Tevî derbasbûna du salan di ser vê dagirkariyê de, nih jî Arkadî Xûkasiyan serokkomarê Artsaxê, Rûbin Wardaniyan wezîrê navxwe û 21 berpirsên din ên Ermenî yên komara Artsaxê li Azerbaycanê girtî ne.

Ji aliyekî din ve ji destpêka 2023’an ve ji bilî Artsaxê, ew dixwazin dest danîn ser hin navçeyên din jî.

Artsax, Nagorno Qerebax an Qerebaxa Jorîn an jî Komara Qerebaxa Çiyayî, ku wek Artsax jî dihat naskirin, dewletek bû ku di asta nevnetewî de bi fermî nedihat naskirin.

Li gor saziya Neteweyên Yekbûyî, ewder, perçeyek ji axa Azerbaycanê ye. Lê di rastî de ewder wek dewleta DEFACTO ji Azerbaycanê veqetiya bû.

Ew, heman dewlet bû ku Azerî û Tirkan têk bir.

Tevî ku di rojên derbasbûyî de berpirsên Ermenistan, Îran, Tirkiye û Azerbaycanê li Tirkiyê civiyan ji bo ku pirsgirêkan çareser bikin, lê heya niha jî alozî didomin.

Komara Nagorno Qerebax yan jî Artsax li başûrê rojavaya Azerbaycanê bû. Ew li rojhelat bi Azerbaycanê re û li rojava jî bi Ermenistanê re hevsînor e.
Ji danezanîna serxwebûna di 1991’an vir ve, zimanê fermî yê Qerabaxê, Ermenî bû. Lê piştî ku Azerbaycanê dest danî ser vê navçeyê, Azerî kire zimanê fermî.

Tevî ku heşîmeta herî zêde ya vê navçeyê Ermenî ye û hinek Kurd jî li wir dijîn, lê di rastî de ne kesek pişta Kurdan digire ku ew li wir bibin xwedî maf û ne jî kesek bi awayekî eşkere pişta Ermeniyan digire.

Saziya Neteweyên Yekbûyî ku weke saziya ji bo parastina mafên neteweyan tê binavkirin, ji bo parastina mafê Ermeniyan li wir tev nagere.

Rast e li wir şerê Kurdan nayê kirin lê belê şerê Ermeniyan û hemû wan pêkhateyan tê kirin ku li dijî serdestiya Azerbaycanê li wir tev digerin.

Mijar kûr e û di heyamên derbasbûyî de Tirkiyê bi awayekî eşkere ragihandiye ku ewê li hemberî Ermenistanê di eniya Azerbaycanê de bin heya tevahiya navçeyan ji destê Ermenistanê yan jî wê dewletê derxînin ku tenê Ermenitsan li pişta wê ye.

Li gor serjimêriya herî dawî ya Ermenitsanê ku sala 2011’an hatiye encamdan, li vî welatî bi giştî nêzîkî 38 hezar Kurdan dijîn ku ji 35 hezar kes ji wan re Êzidî tê gotin û ew 3 hezar kesên din jî wek Kurd hatine binavkirin.

Helbet tê gotin ku Ermenistan jî qet li mafên Kurdan mikur nehatiye. Lê belê di vê navberê de pirtirbûna heşîmeta Ermeniyan li wê navçeyê, nîşan dide ku ew navçe, mafê Ermeniyan e.

Ji xeynî hin gund û navçeyên biçûk ên Azeriyan, lê belê navçeyên din hemû yan jî piranî Ermenî ne.

Li Azerbaycanê jî ji Kurdan re tê gotin Azerî. Li wir qet zimanê Kurdî bi fermî nehatiye naskirin.

Di vê navberê de hin welat jî hene ku dixwazin rewşê aram bikin. Amerîkayê ragehandibû ku çekdarên Sûrî ji Lîbya re hatine veguhestin û ew bûye sedema alozî, şer û kuştinên zêdetir.

DYA herwisa Tirkiye hişyar kiribû û ragehandibû, şandina çekdarên Sûrî bo şerê navbera Ermenistan û Azerbeycanê heman alozî û şer û kuştinên li Lîbyayê dê li wê navçeyê jî dupat bike.

Tirkiye ku di şerê Qerebaxê de piştevaniya Azerbeycanê dike û vê hewla xwe bi hemû awayekî weke qirkirin jî didomîne.

Hevdem serokwezîrê Ermenistanê Nikol Pashinyan bang li civata navnetewî kiriye da ku piştrast bibin ku Tirkiye destê xwe nexe nava nakokiyên di navbera wan û Azerbaycanê de li ser mijara Nagrono – Qarabaxê.

Ev hişdarî ya ji aliyê Serok hikûmetê Ermenistanê ve di wê demê de hat ku şer di navbera Ermenistanê û Azerbycanê da derketî û Tirkiyê piştevaniya xwe bo Azerbaycanê diyar kiribû.

Fardan Taganyan balyozê Ermenistanê li Moskoyê jî daye zanîn ku Tirkiye 4 hezar komên çekdar ê Sûriyê bo şer li dijî Ermenistanê bikin bo bereyên şer ê Azerbaycan û Ermenistanê şandine.

Herwiha Fardan Taganyan tekez jî kiriye ku Tirkiye wan komên tûndrew ê Sûriyê perwerde kirine û dixwaze wan di şerê li dijî Ermenistanê de bi kar bîne.

Îranê helwêsteke cuda hebû û tenê dixwaze berjewendiyên wê parastî bin.

Piştî dagirkirina Artsaxê ji aliyê Azerbaycanê ve, niha berjewendiya herî mezin ji bo Îranê ev e ku nehêle sînorê Ermenistanê bikeve destên Azerbaycan û Tirkiyê.

# Partîya Welatparêzên Kurdistanê li Amedê şeva pîrozbahîya yeksalîya PWKyê li darxist, Serokê Giştî yê PWKyê Mustafa Ozçelîk di vê merasimê de gotarek pêşkêş kir ku parek ji gotarê wî wihaye:



**Mistefa Ozçelîk:**




Firsendên dîrokî li ber derîyê hemû kurda ne, li her perçeyekî Kurdistanê û di navbera her çar perçeyan de pêwîstî bi hev rêzî û koordînasyoneke neteweyî heye.

Belê, di ser damezrandina partîya me de salek derbas bû; lê kadroyên ku PWK ava kirine, zêdeyî 40-50 salî ye ku bi ked û fedekarîyên xwe ve di nav tevgera doza azadîya Kurdistanê de cîh girtine. Di eslê xwe de, Partîya Welatparêzên Kurdistanê berdewamîya, ked, xebat, fedekarî û têkoşîna doza gelê me ya heta îro ye. Teva hemû tecrubeyên biserneketî û nîvçemayî yên yekitîyên sîyasî û rêxistinî; rêvebir û endamên PAKê û TDK-TEVGERê û kadroyên serbixwe gaveke bi cesaret avêtin û di 10ê îlona 2023yê de PWK damezrandin.Partîya Welatparêzên Kurdistanê (PWK), teva hemû şerd û mercên dijwar, teva hemû astengî û kêmasîyên xwe, gav bi gav vê kultura xwe ya nû di nav xwe de hûnand û yeksalîya xwe temam kir.Partîya Welatparêzên Kurdistanê, hêza xwe ji doza meşrû ya gelê xwe distîne. Ew hem partîyeke meşrû, hem jî partîyeke yasayî ye.Herçiqas di derbarê wan de doza girtinê hatibe vekirin jî bidestxistina mafê yasayîbûna PWK, PSK, PDKT û KKPyê destkeftineke dîrokî ya gelê me ye.

Em bi dilsozî bangî ciwan û jinên Kurdistanê, bangî hemû kadir, siyasetmedar û kêsayetîyên serbixwe yên ku weke me xwe di nav xeta neteweyî, azadîxwaz û Kurdistanî de dibînin dikin: Werin li partîya xwe ya neteweyî, azadîxwaz û kurdistanî xwedî derkevin; werin em bi hev re vê xetê geştir û xurtir bikin. Ji ber ku pêşeroja miletê Kurd û kurdistanîyan di vê xetê de ye.Dost û hevalên hêja, mêvanên qedirbilind,Helbete ku di dîroka xebata doza azadîya welatê me de gelek xeletî, şaşitî hatine kirin û hê jî tên kirin. Helbete ku divê em bi rexneyên çêker, avaker, dostane û welatperwerane hev binirxînin, ji hev re bibin alîkar, mihasebeya xeletîyan bikin; lê ne bi hêrs û dijminantî û ne bi dijayetîya ku em hevdu pûç bikin, têk bibin, biçûk bixînin.Divê em bi xweşbînî û kultureke nû, xwe û xebata xwe nûjen bikin. Divê em li gorî dinyaya nû, li gorî sosyolojîya civata me ya nû, rê û rêbazên nû û nûjen biafirînin.Em dibêjin li Bakurê Kurdistanê pêwîstîya gelê me bi partîyeke xurt ya azadîxwaz, demokrat, neteweyî, kurdistanî ya ku bi enerjîya ciwanan, bi hêza jinan, bi zanestîya pispor û rewşenbîran, ango bi keda hemû pêkhateyên civatê ve hatîye hûnandin heye.

Em weke PWK, ji bo pêk anîna tifaqeke stratejîk ya kurdistanî jî, ji bo temsîlîyeteke li ser esasê “Daxwazên acîl yên miletê kurd” jî amade ne.Li Bakurê Kurdistanê ji alîyekî ve Dewleta Tirkîyeyê sîyaseta xwe ya li ser dijayetîya miletê Kurd bi tûndî dimeşîne; ji alîyekî jî siyaset û hişmendîya ku ji bo miletê Kurd û Kurdistanê statuyek siyasî, neteweyî, coxrafî neparêzê û dixwaze pirsa miletê me bes di çerçoweya pirsa wekhevîya hemwelatîyan de pênase bike, berfireh û xurtir dibe. Lê mixabin, li hemberî vê rewşê, partî, tevger û hêzên ku li ser xeta neteweyî û kurdistanî ne, ango ji miletê Kurd û Kurdistanê re statuyek siyasî, millî û coxrafî diparêzin, di nava civatê de lawaz in, belawela ne; nikarin bibin alternatîf û rojevê tayin bikin.Baş e, ji bo ku em vê rewşê û wêneya neyênî ji holê rakin, em hemû partî, rêxistin, tevger û kesayetên neteweyî, demokrat çima bi hişmendî û formateke nû, li ser platform an jî amûr û dezgehên nû yên hevbeş, neteweyî, demokratîk nafikirin? Çima em li ser platform û dezgehên nû yên ku di bernameya xwe de statuyê ji Kurdistanê re bixwaze û daxwazên acîl yên miletê kurd bidin pêş û li Bakurê Kurdistanê û li Tirkîyeyê, hem beşdarî hilbijartinan bibin, hem jî di nav bi milyonan gelê me de bikaribin bibin qadên hevbeş û gelê Kurdistanê bi awakî berfireh bi rêxistin bikin nafikirin; ma gelo di vê derbareyê de ji bo çi em nikaribin dest bi dîyalogeke nû bikin?Belê, werin bêyî qeyd û şerd, bêyî ku em yek xwe li ser yekî din ferz bikin, em di vê derbarê de ji nû ve bifikirin û dest bi dîyalogekê bikin.Şer û pevçûn û nakokîyên di navbera dewletên mezin û yên herêmê de, li gel hinek xeterî û metirsiyan, helbete hinek kês û firsendên mezin jî anîye ber derîyê me kurdan.

Em bangî hemû partîyên li Rojavayê Kurdistanê dikin ku vê kês û firsenda dîrokî ya hatiye ber derîyê we, bi hişmendîyek neteweyî, demokratîk û hevrêzîyê biparêzên û ji dest xwe bernedin. Ji bo birêvebirîyek hevbeş ya eskerî, sîyasî, aborî, dîplomasî dest bidin hev û bi yek helwestê li himberî hemû dewletan bibin nûnerê gelê me.Em bangî hemû partîyên li Rojhilatê Kurdistanê dikin ku li hemberî dagirkerî, zilm û zordarîya Dewleta Îranê yekrêzî û hevkarîyên nav xwe xurtir û geştir bikin; pêwendîyên xwe bi dewletên cîhanê re bi hêztir û berfirehtir bikin. Ew kês û firsenda di sala 1991ê de hate ber derîyê xuşk û birayên me yên Başûrê Kurdistanê, dikare were ber derîyê we jî.Dost û heval û mêvanên rêzdar,Wek ku em hemû dibînin, pirs, pirsgirêk û şerên heyî, di astên cuda cuda de tesîrê li her çar perçeyên Kurdistanê jî dikin.Di rewşa heyî de, dinya ji sazûmenek hevbeş bêpar e û mimkune ku berjewendîyên dewletên mezin û nakokîyên wan ên li gel dewletên herêmê, bibe sebep ku li Rojhilata Navîn nexşe ji nû ve bêne guhertin.Pirsên sereke yên li herêmê, pirsa Kurdistanê û pirsa Filistînê ye. Bi taybetî, heta ku ev herdu pirs çareser nebin, dê aştî û aramî negihêje herêmê.PWK ji bo gelê me yê her çarperçeyên Kurdistanê mafê çarenûsîyê diparêze.Herweha li gorî me, divê gelê Filîstînê jî mafê çarenûsîya xwe bidest bixe û li gel Dewleta Îsraîlê, Dewleta Filîstînê jî hebe. Dive herdu alî jî hevdu qebûl bikin.

Cîhê balê ye ku gava li her çar perçeyên Kurdistanê gelê me tûşî qetlîam, wêrankirin û karesatên mezin dibû û dibe, gelek alîyên ku îro ji bo Filîstînê li kolanan in, mixabin ji bo gelê Kurdistanê tu çalakî û piştgirî nîşan nedane û deng ji wan dernakeve.Xuşk û birayên hêja,Îro em dibînin ku careke din mijara Qanûna Bingehîneke nû ya Dewleta Tirkîyeyê tê minaqeşeke kirin.Em weke PWK, mafê çarenûsîya miletê Kurd û azadîya Kurdistanê diparêzin û ji bo vê armancê têdikoşin.Lê belê, helbete ku em wek alîyê kurd û kurdistanîyan jî ji vê Qanûna Bingehîn ya heyî nerazî ne û em jî dibêjin pêwîstî bi qanûnek bingehîn ya nû heye.Dîyare ku hem alîyên desthilatê, hem jî alîyên muxalefetê li ser neguherandin û nemunaqeşekirina sê xalên pêşî yên Qanûna Bingehîn de hemfikir in.Hersê xalên ewil û hemû Qanûna Bingehîn ya heyî, hebûna kurdan, hebûna Kurdistanê, hebûna zimanê kurdî û mafên perwerdeya bi zimanê kurdî, mafê fermîbûna zimanê kurdî, mafên kolletktîf yên neteweyî, demokratîk yên miletê Kurd, mafê statuyeke sîyasî,cografîk, neteweyî li Kurdistanê, mafên azadî, demokrasî, wekhevî û dadwerîyek rasteqîn li Tirkîyeyê tune dihesibîne û red dike. Werin bi hev re ji bo parastin, bikaranîn û fêrbûna zimanê kurdî em xebat, çalakî û gavên nû bavêjin.Nûnerên rêzdar yên partîyên sîyasî, dezgehên sivîl û yên ragehandinê,Xuşk û birayên delal, dost û hevalên hêja,Bi van hest û bîr û bawerîyên xwe, ez hemû rêvebir, endam û alîgirên PWKyê pîroz dikim, ji ber ked û xebatên wan spasîya wan dikim; ez bi dilgermî spasî û xêrhatina we hemû beşdarên vê ahengê dikim.Bi hêvîya ku hûn şeveke xweş û tije derbas bikin û şeva me ji bo yekitî, hevkarî, tifaq û hevrêzîya hemû alîyên neteweyî û niştimanî bibe destpêkeke nû.Bi rêz û silavên min yên ji dil û dilovanî, bimînin di nav xêr û xweşîyê de.12.10.2024Mustafa OzçelîkSerokê Giştî yê Partîya Welatparêzên Kurdistanê (PWK) Kaynak: Serokê Giştî yê PWKyê Mustafa Ozçelîk : Divê em ji firsendên dîrokî feydê werbigrin

# Rêwîtî û xwendin



N. Vênûs Faqyîq
W. Hesen Mukerem



Gelek kes hene ku ne tenê riwîtî nekirin e, belkû li Ewropayê dijîn, lê zêde guh nedane welatê ku lê dijîn, heta serdana muzexaneyekê jî nekirin e.

Gelek kes hene ku kêm caran derfeta riwîtiyê bo wan peyda bûye lê di warê zanîna çandên neteweyên li derveyî welat de dewlemend in û bi gelek mijarên li welatên din re baş dizanin.

Xwendina pirtûkekê, nemaze romanekê, we bi çanda welatekî an du welatan dide nasîn, bi qasî ku rêwîtiyek çanda welatê ku hûn lê riwîtiyê dikin, bi şertê ku hûn ne tenê ji bo şahî û wênekêşanê belkû bo nasîna jiyan, çand û dîroka wir rêwîtiyê bikin.

**Rêwî ne tenê bilêtek balafirê, çend destek cil, şûşeyek bîhnxweş û hinek pere ye, kêf e, her kes bi awayê xwe û di dawiyê de tevlihevkirin û naskirina çandek nû ye.**

Heger we nexwendiye an jî negeryane, hûn nizanin, wek nimûne, danîna salmon li ser rûyê îtalî û hejmara 17, ne 13, nîşanên byûm in.

Ger hûn neçin rêwîtiyê, hûn ê nizanibin ku tabûta li salona sereke ya Dêra St. Augustine li Annabe, Cezayîr, laşê wî tune belkû tenê hestiyê enîşka Fransiyane li Dêra Pawiya ya bajarê Mîlan a Îtaliya ye wir spartin e anîne wir..

Heger we li ser wê xwendibe an jî li wir geriyane, hûn dizanin ku her çend makezagona Swîsreyê ol û dewletê ji hev vediqetîne jî, dêr dîsa jî pişta xwe bi hukûmetê ve girêdidin û ruhan û kahînan ji dewletê heqdest distînin. Ji bo parastina paqijiyê, qanûn bikaranîna konteynerên bazarê ji bo avêtina çopê qedexe dike.

Sedsala 12`an a Zayînê berhema herî mezin a wêjeya gerê dît, ku berevajî bîranîn û jînenîgarî, li ser aliyên dîrokî, erdnîgarî û civakî yên cîhên ku nivîskaran serdana wan kirin e, disekine.

Mînakên wek Rifa'a Tahtawî, Charles Dickens, Mark Twain û Ernest Hemingway, nivîskarên herî navdar ên wêjeya rêwîtiyê ne..

Dema ku min nivîsek heval û hevkarê xwe Ata Mehmûd li ser gera wî ya vê dawiyê ya Tehranê xwend, ez fêr bûm ku li Tehranê bisiklêt bi pergalek dravdana elektronîkî ji bo veguhastinê têne kirêkirin, û menuyên elektronîkî jixwe di xwaringehan de têne bikar anîn.

**Feylesofê Romî St.Augustine gotiye: "Dinya pirtûkek e, yên ku negerîyane tenê rûpelek xwendine.**

Wisa dixuye ku Augustînus ji bîr kiriye ku xwendina tenê pirtûkekê fersendê dide meriv ku meriv rêwîtiyek bêhempa bike, bi jiyan û mîtolojiya yek an çend neteweyan nas bike.

Min Franz Kafkam bi xwendina xwe nas kir, Gregor (qehreman) sibehekê wek kêzikek mezin ji xew radibe.

Min li ser mala wî ya li Komara Çek û muzexaneya wî xwendibû, heta ku min serdana mala wî ya li Kolana Zêrîn Rhine ya 22-an û muzexaneyê kir, ku hemî wêneyên qonaxên cûda yên jiyana wî ne û destnivîsên jînenîgariya Kafka bixwe ne.

Li heman bajarî Perestgeha Cihûyan a Kevin-Nû heye, ku tê de qutiyeke cam a bi şiklê du tabloyên kevirî ku tê de 10 wesiyeta Mûsa tê de hene ku her i hundirê wan sandinên şoşe de çendîn çirayên elekterîkî yên kesayetiyên navdar ên koç kirî diterisin ku yek ji wan b Kafka danîn e.

Herçend rêwîtî ji bo gelê Kurdistanê hinekî hêsan bûye jî, pirtûk û înternet jî ji bo gerê fersendeke bêhempa ye ku meriv xwe bigihîne welatên din û bi erdnîgarî, dîrok, jiyana civakî û siyasî nas bike.

Ji ber vê yekê her yek ji me bi awayek kêfa rêwîtiyê û xwendinê dike.



# hunera wergêranê, Wergêrê xwedî şiyan û Berhemanîna Wergêranekî Baş (Beş 1)



N. Rojan Sofîzade
W. Hesen Mukerem




Werger wergerandina metneke nivîskî ye ji zimanekî bo zimanekî din, daku metneke nû û wergerî bê amadekirin ku naverok û dîtinên çandî yên nivîsa eslî (çavkanî) û adet û çanda metna nû nîşan dide.

Wergêran ji bo hêsankirina danûstendina di navbera kesên ku bi zimanekî cuda dixwînin an dinivîsin û xwedî mîrateke çandî ya cuda ne, hêsan dike. Werger pêwîst dibe dema ku em dixwazin agahiyê bi kesên ku pêdiviya wan pê heye, lê yên ku ji zimanê orîjînal fam nakin re ragihînin. Ji ber vê yekê, werger ji bo hêsankirina danûstendina di navbera zimanên cûda û danûstendina çandî û agahdarî de pêdivî ye.

Werger pirek e di navbera zimanên cuda de da ku hemû mirovên cîhanê, li kîderê bin, dikarin bi hev re têkiliyê deynin. Bê wergerandin, tu pêşketinên îroyîn ên zanistî, çandî û civakî çênabin. Wergêr wek çêkerê vê pirê ye. Wergera nivîsê ne tenê berhevkirina peyvên hevwate di zimanên cuda de ye, zanîna strukturên hevokê di zimanên çavkanî û meqsedê de û di her zimanî de heman peyvan rast bi kar anîna ne karê her kesî ye û tenê wergêrên baş û pispor dikarin wê bikin.

Anko awayê rêzkirin û berhevkirina peyvan ji bo afirandina wateyên hevwate li gorî zimanî diguhere û wergerek "peyv-bi-peyv" a metna çavkanî bêwate dibe; Ji ber vê yekê, li vir e ku şiyana wergêr ji bo werger û serweriya her du zimanan tê lîstin.

Di vê gotarê de em ê hewl bidin ku bi kurtî li ser wergerek baş û jêhatîbûnên ku wergêrek pêdivî ye ku nivîsek baş çêbike bi kurtî nîqaş bikin. Taybetmendiyên wergereke baş:

-Wergerek heke hin taybetmendiyên wê hebin, bo nimûne, naverok û peyama metnê çavkanî bi xweşikî û baş ragihîne dikare baş be. Wergereke baş jî bi hevokên kurt û bê xeletî (di warê rastnivîsîn û rêzimanê de) bi xwendevanên xwe re bi hêsanî diaxive. Li vir çend xalên girîng hene.

-Wergerê baş ew e ku "peyv bi peyv" neyê wergerandin.

Heger meriv bixwaze nivîsekê "peyv bi peyv" wergerîne, baştir e ku zêde xwe neêşîne, ji ber ku îro peyv bi peyv wergera nivîsê bi giştî ji hêla nermalava wergerê ve tê kirin, wek mînak "Google Translate". Her çend ev cure nermalava werger û werger gelek pêşketibe jî, dîsa jî cîhê xebatê heye û nikare şûna mirovan bigire. Yek ji kêmasiyên herî girîng û girîng ên nermalava wergerê, bi taybetî Google Translate, wergera peyv bi peyv e. Loma jî wergereke baş "peyv bi peyv" nayê wergerandin û hevokên zelal hene ku xwendevan baş jê fam dike.

- Di wergereke baş de hevokên kurt û zelal tên bikaranîn.

- Di metna wergerandinê de hevok çiqas dirêjtir bibin, nivîs tevlîhevtir dibe û xwendina wê ji bo xwîner dijwartir dibe, ji ber vê yekê eleqeya wî bi xwendina wê nivîsê re kêm dibe. Hevokên dirêj xwîner ditirsin. Hergê tu nivîseke wergerkirî bixwînî ku hevokên wê kurt, zelal û herikbar bin, tuyê bibînî ku ew wergereke baş e û bi rastiyeke mezin hatiye wergerandin.

- Di wergereke baş de, wate, naverok û peyama metna çavkanî tê parastin.

- Di wergereke baş de, prensîba "bawerî" tê dîtin. Prensîba "baweriyê" yek ji şertên herî girîng ên wergereke rast û baş e; Bi awayekî ku metna çavkanî bi awayekî herî baş bê destwerdan wergerîne zimanê mebest û wate, naverok û têgîna wê neyê guhertin. Ji ber vê yekê bi rêzgirtina ji peyam, naverok û wateya metnê çavkanî, wergereke bi kalîte hatiye pêşkêşkirin û îxanet li nivîskar nehatiye kirin.

- Di wergera baş de xeletiyên rastnivîsîn û rêzimanî tê de tune.

- Di wergereke baş de, prensîba "bawerî" tê dîtin. Prensîba "baweriyê" yek ji şertên herî girîng ên wergereke rast û baş e; Bi awayekî ku metna çavkanî bi awayekî herî baş bê destwerdan wergerîne zimanê mebest û wate, naverok û têgîna wê neyê guhertin. Ji ber vê yekê bi rêzgirtina ji peyam, naverok û wateya metnê çavkanî, wergereke bi kalîte hatiye pêşkêşkirin û îxanet li nivîskar nehatiye kirin.

- Di wergera baş de xeletiyên rastnivîsîn û rêzimanî tê de tune.
- Helbet dibe ku di nivîseke kurdî ya baş ya wergerandî de xeletiyên rastnivîsê jî hebin, ji ber ku mixabin hêj tîpeke me ya standard tuneye, ji ber ku em ne xwedî dewlet in; Bê dewlet, hûn nikarin saziyek taybet û dewletî hebe ku vê yekê ji we re bike (mînak, li Îranê saziyek dewletê heye bi navê Ferhenga Zimanê Farisî ku di vî warî de kar dike).

- Ji aliyê din ve, ji ber pêşketinên ecêb di warê nermalavê û îstîxbarata çêkirî de, xeletiyên rastnivîsê yên di zimanên wekî Îngilîzî, Frensî, Almanî û hwd de gihîştiye sifirê û bikarhênerên wan dikarin di nivîsên xwe de xeletiyên rastnivîsê bibînin û rast bikin. demeke pir kurt.

- Di wergereke baş de "pêbendî" bi rêk û pêk tê hesibandin.

- Di nivîsê de nebûna xeletiyên rastnivîsê û rêzimanî çiqas girîng e, girtina xalbendan jî bi heman awayî girîng e. "," di hevokê de dikare wate û armanca hevokê biguherîne. Ji bo bikaranîna hevokên kurt û herikbar di nivîsê de danîna (.) jî pêwîst e. Li hevokên jêrîn binêrin û bibînin ka çawa "," wateya- hevokê diguherîne:
ne hewce ye, wî îdam bikin.

2. Lêborîn ne hewce ye ku were îdam kirin.
Herdu hevokên li jor tam wek hev in, tenê "," hatiye guhertin. Lê di hevoka yekem de kesek tê îdamkirin û di ya duyemîn de jî kesek tê efûkirin û rizgarkirin.

**Ev gotar berdewam dike.**

# Binpêkariyên mafê mirovî li Kurdistanê

## Li girtîgeha Adilabadê de rêjîmê 10 kes bidar vekirin

Rêjîma Îranê li 22ê Rezberê de 6 kes û li 9ê Rezberê de 4 kes li girtîhgeha Adilabad a rêjîmê li bajarê Şîrazê de bidarvekirine, bi wî awayî, rêjîma Îranê li heyva Rezberê, li girtîgehên xwe de zêdetir ji 100 kes bidar vekiriye.



Pêka rapora Navenda Mafê Mirovî li Îranê, vê rêjîmê li roja Yêkşemî 22ê Rezberê de 6 girtî li girtîgeha Adilabadê li bajarê Şîrazê de bidar vekirine û herwisa li 9ê Rezberê de jî 4 binçavkiriyên din li vê girtîgehê de hatibûne bidarvekirin ku bi tohmetên pêywendîdar bi madên hîşber an kuştina bi zanebûn, ji aliyê dadgehên rêjîmê ve sizaya bidarvekirinê bi ser wan de hatibû sepandin û hatine bidarvekirin.

Vê navenda mafê mirovî daye zanîn ku hejmara bidarvekirinan li heyva Rezbera Îsal de ji 100 haletan derbas bûye û renge ew amare heta dawiya vê heyvê gelek zêdetir bibe.

Rêjîma Îranê, sizaya bidarvekirinê wek alavek bo çavtirsandin û tepeseriya zêdetir a xelkê Îranê bi taybet gelên "Kurd û Beûç" bi kar tîne ku bikare tevî sepandina desthilata xwe bi ser xelkê, wan ji encamdana her cure nîşandana nerizayetî an serîhildanekê bitirsîne.

## Rêjîma Îranê li du rojan de 18 kes bidar vekirin

Rêjîma Îranê 18 kes li 2 rojan de bidar vekirin, ew yek li roja cihanî ya "Ne bo Bidarvekirinê" û roja piştî hingê de bû.




Rêjîma Îranê roja Çarşemî 18ê Rezberê, li girtîgeha Qizilhisar li bajarê Kerecê de zêdetir ji 10 mêr û jinek, bidar vekirine ku 2 kes ji wan Belûç, 2 kes Kurd û 2 kes jî xelkê Efxanistanê bûne ku li vê girtîgehê de hatine bidarvekirin, herwisa li girtîgeha Çûbînder a rêjîma Îranê li bajarê Qezwînê de jî 2 kes hatine bidarvekirin.

Herwisa roja 19 ê Rezberê 2 girtiyên Kurd bi navên Borhan Ensarî xelkê Urmiyê û Esed Ferheng xelkê bajarê Seqizê li girtîgeha Urmiyê de hatne sêdaredanê.

Roja 20 ê Rezberê jî 3 girtiyên dinê li girtîgeha rêjîmê li Kerecê de hatne bidarvekirin.

Birêveçona bidarvekirina wan 18 girtiyan li halekê de ye ku roja Pêncşemî 19ê Rezberê, roja cîhaniya "Ne bi bidarvekirinê" bû û rêjîma Îranê bi rohnî dide xuya ku ti girîngiyekê nade canê mirovan û herwisa yasayên navnetewî yên mafê mirovî.

## ciwanek li nav bajarê Kirmaşanê, ji aliyê rêjîma Îranê ve hate kuştin

ciwanekî xelkê bajarê Kirmaşanê li nav wî bajarî de ji aliyê hêzên dijemirov ên rêjîma Îranê li nêzî şûnwarê dîrokiya "Taqê bostan"ê li ber çavê xelkê, hate kuştin, wan hêzan berî kuştina wî ciwanî, teqe li xelkê din jî kirine.



Roja Sêşemiyê 17ê Rezberê, cîwanekî temen 22 salî yê bi navê "Mêhrşad Elmasî", xelkê taxa "Anahîta" ya bajarê Kirmaşanê, li nêzî cihê geştiyarî û dîrokiya "Taqê Bostan" a bajarê Kirmaşanê, ji aliyê hêzên çekdar ên rêjîma Îranê ve li ber çavê xelkê hate kuştin.

Pêka zaniyariyên geheştî, "Mêhrşad" bo rêgirîkirin ji destbeserdegirtina hêzên çekdar ên rêjîmê bo ser motorsîklêta xwe, hewla xwederbaskirin ji dest wan hêzên hov daye û hêzên rêjîmê tevî teqekirin li xelkê, ew jî kirine armanc û kuştine.

Herwisa li vê raporê de hatiye ku 2 gulle bi "Mêhrşad Elmasî" kevtine û ew kuştiye lê xelkê li wir, tevî ku rastî gulereşandina wan hêzên hatine, ti kes birîndar nebûye.

# Agirî


◆ Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
◆ www.Kurdistanmedia.com
◆ www.Agirimedia.org
◆ rojnamaagiri@gmail.com
◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (480)